Bidestveanîna mafên neteweyî yên gelê Kurd di çarçoveya Îranek Demokratîk û Federal de

Hejmar: 123
21'ê Çiriya Paşîn a 2009
Buha: 150 Tûmen

agirî

Duheftînameya siyasî, civakî, çandî û hunerî

Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

**Spasiya Federasiyona Seranserî ya "Yarsan" Ji Birêz Mistefa Hicrî**

Federasiyona Seranserî ya Yarsanê li Swêdê, spasiyek bêdawî ji Kek Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî û hemû Kadro û Pêşmergeyên PDKÎ derheq peyama pîrozbahiya wî bi minasebeta cejna Xawenkar ji peyrewên ayîna Yarsan kir û her wiha dibêje ku me milbimilê hevwelatiyên xwe yên kurd li xebat û tekoşîna bo rizgariya neteweyî de beşdarî kiriye û heya gihîştin bi armancên pîroz yên xwe jî em dê xebata xwe bidomînin û dê her wefadar bi neteweya xwe jî bimînin.

# Bêdengî Li Hember Cinayetê, Destê Cinayetkaran Vekirîtir Dike



Nerazîbûnên kom û komeleyên navneteweyî û nawendên berevankar yên mafên mirovan li Îran û Kurdistanê li hemberî îdama Ihsan Fetahiyan berdewam in. Li gorî rapora nûçegihaniya Kurdistanê, xwendekarên zanîngeha Tehranê roja Duşemî, 25'ê Xezelwerê bo nîşandana nerazîbûna xwe li hember îdama Ihsan Fetahiyan civînek pêk anîn. Li vê civînê de çendîn daxuyanî bi merema mehkûm kirina îdama wî çalakê siyasî hatine xwendin. Xwendekarên kurd herweha li dijî girtina çendîn çalakên din yên siyasî yên de nerazîbûna xwe nîşan dan û li doma vê civînê de sirûda netewî ya "Ey Reqîb" ê hate xwendin û paşan dirûşmên "Kurdistan, Kurdistan, goristana faşîstan" û "Girtiyên siyasî divêt serbest bihên berdan" qîrandin. Herweha li gorî Nûçegihaniya Kurdistanê, girtiyên girtîgehên Sine û Urmiyê jî bi nîşaneya nerazîbûnê, dest bi gireva birçîbûnê kirine. Hêjayî gotinê ye ku Deftera Siyasî a PDKÎ berê di daxuyaniyek taybet de û paşan jî di daxuyaniyek hevpar tevî Partiyên Siyasî yên Kurdistanî de îdama ew çalakê kurd mehkûm kir. Deqa her du daxuyaniyan li rûpel 2 ya Agirî de.

## Îran Mezintirîn Goriyê Şewba Berazan Li Rojhilata Navîn De




Li gorî malpera "Radio Newa"yê, hejmara goriyên Şewba Berazan di Îranê de gihîştiye 100 kesan. Herwiha 3128 kesên din jî tûşî vê nexweşiyê bûne ku di nava wan goriyan de 14 qutabî jî tên dîtin. Navenda Babetên Mirovî a ser bi saziya "NY" di vê derheqê de ragihandiye ku Îran li nava 22 welatên Rojhilata Navîn de xwediyê zortirîn hejmara goriyên Şewba Berazan e. Eva di halekê de ye ku berpirsên hikûmetî girîngiya taybet û herwiha rê û cihên hewce bo pêşîgirtina vê nesaxiyê nagirin pêşiya xwe.


**13ê Xezelwerê, Gavek Ber Bi Pêşve**
Mistefa Hicrî 3



**20 Sal Piştî Dîwarê Berlînê**
Ebdullah Hicab 5



**TENGEZARÎ**
Adar Jiyan 9



**Derbarê Îdamkirina Ihsan Fetahiyan:**

# 9 Partiyên Kurdistanî Daxuyaniyek weşandin


**Bi hinceta darvekirina girtiyê siyasî yê Kurd Ihsan Fetahiyan, 9 partiyên Kurdistanî daxuyaniyek hevbeş a çapemeniyê belav kirin, li jêr deqa wê daxuyaniyê ketiye ber çavê wê xwendevanan:**

**Daxuyaniya hevbeş a hêzên siyasî ên Kurdistanî derbarê îdamkirina Ihsan Fetahiyan**

Roja çarşem 11ê Mijdara 2009an a Zayînî, serêsibê Ihsan Fetahiyan yê temen 28 salî û xebatkarê siyasî li girtîgeha Sine bi destê mirovkujên Komara Îslamî a Îranê hat îdamkirin.

Ewa ne cara yekem e ku destê Komara Îslamî a Îranê bi xwîna keç û xortên gelê Kurd sor dibe û bêguman cara dawî jî nabe. Her wek pêşdîtin dihat kirin pêleke serkut û îdamkirinê li pey şanogeriya bi nav hilbijartina îsal û terîkketin, munzewîbûna rejîma Komara Îslamî li dinyaya derve û zêdebûna kirîz û pirsgirêkên navxweyî û pêlên nerazîbûna xelkê ku roj bi roj ew rejîm xistiye bin zext û givaşê di rê de be, lewra Komara Îslamî bi penahbirin bo zext û tundûtûjî û îdamkirina ciwanên xebatkar û keç û xortên azadîxwaz ên neteweyên Îranê û bi taybet keç û xortên netewa Kurd ku pêşengên xebata rizgarîxwaziya Kurd bûne, bi darvekirina ciwanên Kurd kerb û kîna xwe dirêje.

Pêwîst bi amajê ye ku Ihsan Fetahiyan sala borî li Kamyaranê tê binçavkirin û bi tometa "muharibe" (şer ligel Xwedê) bi rêya hewldan li dijî tenahiya neteweyî, ji aliyê dadgeha binav şoriş a bajarê Sine bi




10 sal cezayê girtîgehê û dûrxistina bo bajarê Ramhurmizê hat mehkûmkirin, lê piştî xuyakirina nerazîbûna parêzerê Ihsan Fetahiyan li hember vê biryarê, dadegha pêdeçûnê li ser daxwaza Dozgerê Giştî yê Kamyaranê hukmê wî bo îdamê guherand!

Em wek Partiyên Siyasî ên Kurdistanî ku me ew daxuyanî îmza kiriye, bi tundî wê cinayetê mehkûm û şermezar dikin û daxwaz ji rêxistinên mirovdost û kom û komeleyên navneteweyî dikin ku li hemberî vê cinayeta rejîma Komara Îslamî bêdeng nebin û wê cinayetê mehkûm bikin û ji bo çarenivîsa girtiyên din ên siyasî ku di bin îşkenceyên herî hovane ên wê rejîmê de ne hewla xwe bidin. Ji ber ku bêdengî li hemberî kiryarên dijî mirovî ên rejîma Îranê wisa dike ku kirin û kiryarên gelek nemirovanetir encam bide.

Di dawî yê de, ligel hevderdî tevî malbata Şehîd Ihsan Fetahiyan û hemû şehîdên rêya azadiyê, em hêvî dikin bi hewl û têkoşîna hemû hêzên xebatkar û azadîxwaz, temenê rejîma Komara Îslamî a Îranê kurt bibe û ew rejîm ji holê rabe û em bi azadiyê şad bin.

**Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê**
**Partiya Sosyalîst a Kurdistanê – PSK**
**Komeleya Zehmetkêşên Kurdistanê**
**Partiya Demokrat a Kurd li Sûriyê (El Partî)**
**Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûriyê**
**Partiya Azadiya Kurd li Sûriyê**
**Partiya Pêşverûya Kurd li Sûriyê**
**Rêxistina Xebata Kurdistana Îranê**
**Partiya Azadiya Kurdistan – PAK**

**Daxuyaniya Deftera Siyasî ya PDKÎ:**

## Derbarê Zêdebûna Pêvajoya Darvekirinê û Îdamkirina Êhsan Ietahiyan

Herçiqas di heyamê 30 sal desthilatdariya Komara Îslamî de xelkê Îranê bi giştî û azadîxwazên Kurd bi taybetî di bin rewşa serkut, qirkirin û zîndanîkirin û gellek car jî darvekirinê de bûne, ew rastî ne li xelkê Îranê veşartî bûye û ne jî li sazî û dezgehên navneteweyî ên alîgirê mafê mirovan, heta pirr car jî ew kiryarên dijîgelî digel mehkûmkirin û xuyakirina bêzariyê rûbirû bûne, lê tu demekê nekarîne sînorekê ji Komara Îslamî re danînin û berlêgirtinê ji wan kiryarên serberedayî bikin ku li dijî xelkê Îranê bi giştî û bi taybet keç û xortên gelê Kurd bi eşkere û berfirehî dimeşîne. Her ew yek ê bûye sedem ji bo wê rejîmê ku bi destê vekirî û bê tirs xwîna xelkê birijîne, malwêraniyê ji bo xelkê pêk bîne û rewşa xem û tazî û kovanan bi ser civakê û malbatan de zal bike. Ger ew pêvajo li hemû Îranê berdewam dimeşe, li Kurdistanê û derheq keç û xortên netewa Kurd berfirehtir û dirindanetir tê encamdan û meşandin. Roj nine ku bi tomet û hêcetên curbircur û bê bingeh xwîna ciwanên Kurd bi destê hêz û dezgehên serkutker ên rejîma Komara Îslamî neyê rijandin, di rastî de tawana wan jî Kurdbûn û deng bilindkirin ji bo azadî, demokrasî û binpêkirina mafên wan e.

Cinayeta dawî a Komara Îslamî heta îro, îdamkirina xortê Kurd Ihsan Fetahiyan e ku roja çarşem 11ê Mijdara 2009an a Zayînî, serêsibê li girîgeha bajarê Sine hat şehîdkirin û rûpeleke din ya cinayetan ket ser karnameya tejî rûreşane a vê rejîmê.

Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê digel mehkûm û şermezarkirina hemû cinayetên rejîma Komara Îslamî û darvekirina Ihsan Fetahiyan, behî û sersaxiyê dibêje malbat û kesûkarên vî şehîdê Kurd û xwe di xem û kovana wan de hevbeş û beşdar dizane. Di heman demê de û di halekê de rû li civatên xelkê Kurdistanê û azadîxwazên Îranê dike ku pêvajoya wan kuştin û qirkirin û îdamkirinan zêde bûye û ber bi wê çendê diçe ku ji bo çavtirsandina xelkê berfirehtir jî bê kirin.

Lerwa ewa ku dikare li pêşîgirtin ji Komara Îslamî û doma encamdana wan cinayetan bi bandor be, tenê yekîtî û yekrêziya xelkê Îranê bo hiloşandina vê rejîmê ye. Divê em hemû aliyek ji wê rastiyê agahdar bin ku bêdengî li hemberî wan hemû afirandina cinayetên rejîmê de xwesteka rêber û dezgehên serkutker ên Komara Îslamî dabîn dike û destê cinayetkaran li domandina kuştinan vekirîtir dike.

Bi wê hêviyê ku hemû keç û xortên netewa Kurd û azadîxwazên Îranê hest bi xeter û metirsîdarbûna zêde ya wê pêvajoyê bikin û bi helwêsta xwe a jêhatî nîşan bidin ku ne tenê bi afirandina van cinayetan teslîm nabin, belku li ser daxwaz û xwestekên xwe dê mikumtir û micidtir bin û li hemberî rejîma Komara Îslamî a Îranê dê bi helwêsttir bin.

Silav li canê paqij yê Şehîd Ihsan Fetahiyan û hemû şehîdên rêya azadî û rizgariya Kurdistanê

**Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê**
**Deftera Siyasî**
**12.11.2009**
**21.08.2009**

www.arsivakurdi.org

# 13ê Xezelwerê, Gavek Ber Bi Pêşve



**Mistefa Hicrî**

Tevgera dijî dîktatoriya Komara Îslamî ku hevdem digel hatin ser desthilata wê rejîmê ji dayik bû, bi dirêjiya 30 salên borî de gelek evraz û nişîv û astengên mezin qedandine û bi xwîna hezaran keç û xortên azadîxwaz ên neteweyên cuda yên vî welatî hatiye avdan, piştî şanogeriya hilbijartina gera dehem a Serokkomariyê di 12'ê hezîrana 2009'an de, Îran ket nav pêvajoyeke nû. Ragihandina encama vê hilbijartinê bû sedema teqîna hêrsa xelkê bêzarbûyî ji dest Komara Îslamî û bo cara yekemîn di temenê vê rejîmê de li rê û şeqamên Tehranê meşên milyonî yên nerazîbûna xelkê ji wê rejîmê hatin lidarxistin. Ligel wê çendê ku ev nerazîbûn bi nirx û buhaya kuştina dehan kes û birîndarbûn û zîndanîkirina hezaran kesên din bi dawî hat, lê dirûşmên meşan li çarçoveya hinek xwestekên destpêkî wek daxwazkirina dengên ku avêtibûn sindoqan, hilweşandin û betalkirina encama hilbijartinan û diyarîkirina Mûsewî li cihê Ehmedînejad tev digeriyan. Rêberên vê tevgerê – Kerûbî û Mûsewî – li hemberî dirûşmên radîkal ên xelkê di derbarê guherîna rejîma Komara Îslamî de astenga sereke bûn.

Mûsewî û Kerûbî ji bo bihêzkirin û ji nû ve rêxistina Komara Îslamî xebat dikirin, lewra li gor wan birina bingehên sereke ên vê rejîmê wek qanûna bingehîn, Wilayeta Feqîh û Komara Îslamî bo jêr pirsê wek hêlên sor dihatin hesibandin û divê kes wan hêlên sor nebezîne.

Di wê demê de PDKÎ ligel xuyakirina hevderdî digel malbatên şehîdan û girtiyên wan bûyerê, kiryar û riftarên rejîmê li hemberî xelkê nerazî mehkûm kir û ragehand; bi wan dirûşman û bi rêberî û serkêşiya wan kesayetiyan, tex û qatên cuda ên civak û neteweyên Îranê tevlî wan meş û xwenîşandan nabin û bi vî awayî jî rizgarî û azadî li çengê Komara Îslamî dernakeve.

Bi kêfxweşî ve di rojên dîrokî ên vê dawiyê de, wek îna dawî a meha Remezanê (Roja Quds) û roja 13ê Xezelwer (4ê Mijdara 2009) salvegera dagirkirina Balyozxaneya Amerîka ji aliyê bi nav xwendekarên 'peyrewên hêla Îmam' guherîn di naveroka pêvajoya dirûşman de çêbû, bi taybet di 13ê Xezelwer (4ê Mijdar) ku armanca vê nivîsarê ew e ku bûyerên wê rojê zêde şirove bike û balê bikişîne ser wan.

Di wê rojê de ligel wê çendê ku hêzên serkutker ên Komara Îslamî bi hemê hêz û alavên pêwîst ên qirkirina bi armana berxwedan digel meşên nerazîbûnê hatibûn ser şeqaman, bi tayber ser du şeqamên 'Kerîm Xanê Zend' û 'Heftê Tîr' ku li nêzîk cihên berê yê Balyozxaneya Amerîka hilketine û meşa alîgirên rejîma Komara Îslamî li wir rêve diçû. Lê li gor agahiyan, xwenîşandanên nerazîbûnê ku dehan hezar kes têde beşdar bûn, di bin êrîşa hov û dirindane a hêzên serkutker hat lidarxistin. Dirûşmên wê meşê li dêlva ku xuyakirina nerazîbûnê li dijî Amerîka û Îsraîlê be ku armanca rejîma Komara Îslamî jî bû, berevjî wê çendê, meş bûn qada dirûşm avêtin li dijî rejîma Komara Îslamî û piştîvanên wan ên biyanî wek Rûsya û Çîn. Xala veguherîna dirûşmên wê rojê ji aliyê xwenîşanderên nerazî berevajî rojên piştî ragihandina encama hilbijartinê, ew bû ku neman û ji holê rabûna rejîma Komara Îslamî di tevahiya xwe de kiribû armanc.

Ger em bixwazin bi kurtî derbarê bûyerên 13ê Xezelwerê (4'ê Miydarê) kombendiyekê bikin, divê em bêjin:

1. Bûyerên wê rojê û dirûşm û kiryarên neraziyan, hêvî bi refomr û guherînan di çarçova vê rejîmê de bi dawî anî û rêya ron û eşkere a meşiyan ber bi rizgariya yekcarî nîşan da, ew jî bi tevahî ji holêrakirina Komara Îslamî û cudakirina ol ji hikûmet ye.

2. Ligel wê çendê ku hinek dirûşm bi alîgirî ji Mûsewî û Kerûbî hatin dan, lê rol û bandora wan du kesayetiyan di organîzekirin û rêvebirina xwenîşandanan de ji carên berê gellek lawaztir bû. Mûsewî heta di meşê de beşdarî nekir û dema ku Kerûbî jî tevlî meşê bû ragehnad ku eger li dijî Komara Îslamî dirûşman bidin, ew dê xwepêşandanê bicîh bihêle, lê xelkê guhdariya wî nekir. Ew çalakî wê rastiyê derdixin holê ku gav bi gav meş li pey bername û rêberatiya guncaw û jêhatî a xwe ne û pêvajo ber bi wê çendê diçe ku hêdî hêdî rolê rêberatiya Mûsewî û Kerûbî di xwenîşandanan de ji ortê rakin.



Mistefa Hicî:
*"Di heyamê 30 sal temenê Komara Îslamî de, ev cara yekemîn e ku bi eşkere dirûşmên wiha tund û radîkal ji aliyê dehan hezar kes ji xelkê neazî dihatin qîrandin"*

Dirûşmên wek 'Xameneyî qatîl e, Wîlayeta wî batil e', 'Neman bo esla Wilayeta Feqîh'. Di heyamê 30 sal temenê Komara Îslamî de, ev cara yekemîn e ku ev dirûşm bi eşkere ji aliyê dehan hezar kes ji xelkê nerazî dihatin dan. Heta wêneyê Xameneyî ku li ser parçeyeke pirr mezin bi dîwarê ser şeqameke Tehranê hatibû daliqandin, anîn xwarê û pêpes kirin.

Rejîma Komara Îslamî bixwe û hemû yên ku vê rêjîmê nas dikin, dizanin ku esla Wilayeta Feqîh bingeha sereke a vê rêjîmê ye û xwenîşanderên nerazî bi şarezabûn bi ser vê rastiyê xwestin li cihê dirûşmên pûç û bê mifah ên rojên destpêkê, bi xelkê hemû raya giştî ya cîhanê û rejîmê û alîgirên wê li hundir bidin xuyakirin ku ew ji refom di çarçova wê rejîmê de bê hêvî bûne û niha ji bo rizgariya dawî, ango nemana rejîma Komara Îslamî têkoşînê dimeşînin. Ji xeynî wan dirûşmên li dijî Welayeta Feqîh, sloganên din jî di vê derbarê de hatin guhdarîkirin: 'Gelê me yekdeng e, Ol ji hikûmetê cuya ye', dirûşmek ku bi tevahî tirs xistiye nav dilê rejîma Komara Îslamî.

3. Ligel wê yekê ku dirûşmên vê carê li dijî tevahiya rejîma Komara Îslamî bûn, lê bi xweşî ve tu dengûbasek ji kuştiyan tunebû û jimara kesên girtî û binçavkirî jî ji carên berê pir kêmtir bû, ew yek ne ji ber wê çendê bû ku Komara Îslamî bi dilovanî tevgeriya ye, belku rast ji ber wê çendê bû ku rêjîma Komara Îslamî ditirse û baş dizane ku kuştin û zîndanîkirin nagihîje hawar û dada wê. Pêşdeçûna vê pêvajoyê dibe sedema wê çendê ku rejîma Komara Îslamî bi têdîtinên zêde xelkê binçav bike. Lewra em dibêjin, 13ê Xezelwerê gaveke mezin ber bi pêşve bû û mizgîniya gavên bi bandortir ên din di pêşerojê de dide me.

**Çavkanî: Malpera www.sikirter.org**

www.arsiv.org

# Hûrdekariyên Proseya Vebûna Kurd Li Tirkiyê Tên Eşkerekirin



**Azad Kurdî**

Piştî ku Partiya Dad û Pêşdeçûnê (AKP) pêvajoya "vebûna Kurd" anî holê, ev proses digel evraz û nişîvên zêde ên siyasî rûbirû bû. Lê ji xeynî dijberên aştî û gotûbêjan û neyarên pîşeyî û herdemî ên çareserkirina pirsa Kurd li Turkiyê, hatne rojeva vê pirsê piraniya mirov û aliyên demokrasîxwaz û aştîxwaz li Tirkiyê û bakurê Kurdistanê û herêma Rojhilata Navîn û heta seranserê cîhanê dilşad û kêfxweş kir û hêviyek nû xist nav dilê evîndarên aştî û bi hev re jiyana aştiyane û dûr ji şer û tundûtûjiyê. Bi taybet hatne rojeva vê proseyê dilê netewa Kurd li hemû parçeyên Kurdistanê şad kiriye, bi wê hêviyê ku pirsa mezintirîn perçeyê Kurdistanê ber bi çareseriyê diçe û hemû Kurdek bi vê pêvajoya nû li bakurê Kurdistanê xweşbîn e û hêvî pê peyda kiriye.

Lê pirsgirêk û astenga sereke li pêşberî çareserkirina doza Kurd li bakurê Kurdistanê, bi taybetî di vê qonaxa nû de ku ji aliyê hikûmeta AKPê ve ketiye rojeva, hebûna bê baweriyê di nav xelkê û hêz û rêxistinên Kurdî li hemberî hikûmet û partiyên xwedî nifûz û desthilat li Tirkiyê ye. Lê bi hilgirtin û destpêkirina gavên jêhatî û pratîkî ji aliyê hikûmeta Tirkiyê dikaribe ev prose bihêz û berfirehtir bê kirin. Ji ber ku hêşta raya giştî a Kurdan li wî perçê Kurdistanê û heta hêz û rêxistinên siyasî, çandî, civakî û sivîl û kesayetî û rewşenbîr li ser cidîbûn û mikumbûna hikûmeta Tirkiyê derbarê çareserkirina demokratîk û aştiyane a pirsa Kurd bi tevahî ne piştrast in. Bi vî halî jî hemû aliyekê bi kiryar pêşwazî li vê pêvajoya nû kirine. Di rewşeke wiha de, ji bo bidawîanîna bi bê bawerî û rakişandina bala Kurdan wek aliyeke sereke yê wê pirsgirêkê, pêwîst e hikûmeta Tirkiyê gavên micid û meydanî biavêje.

Hevdem digel berdewambûna bas, nîqaş û gotûbêjên derbarê proseya Vebûna Kurd û rêyên çareseriya doza Kurd li Tirkiyê, hûrdekariyên naveroka pêngavên hikûmetê di vê rêyê de tên eşkerekirin. Hefteya borî beriya xistne berbasa prosesa vebûna demokratîk li Parlamena Turkiyê di 10ê Mijdara 2009an ku AKPê anî berbas û gelek nîqaşên tund û cidî di parlamenê de debarê mijarê ketin rojavê, medyayên navxweyî ên Tirkiyê komek hûrdekarî derbarê pêvajoya vekirina demokratîk berbirûyê Kurdan eşkere kirin. Medya û çapemeniyên Tirkiyê, bi taybet televizyonên NTV û CNN Turk, çendîn gavên di vî warê de eşkere kirin ku hinek ji wan ev in:

**Pirsgirêk û astenga sereke li pêşberî çareserkirina doza Kurd li bakurê Kurdistanê, bi taybetî di vê qonaxa nû de ku ji aliyê hikûmeta AKPê ve ketiye rojeva, hebûna bê baweriyê di nav xelkê û hêz û rêxistinên Kurdî li hemberî hikûmet û partiyên xwedî nifûz û desthilat li Tirkiyê ye**



Di civîna rojên 10 û 13ê Mijadara 2009an de li Parlamena Turkiyê, parlamenterên partiyên opozîsyonê, bi taybet nûnerên her du parityên CHP û MHP wek du dijberên pîşeyî û herdemî ên çareserkirina pirsa Kurd li Tirkiyê dijberiya proseya vebûna demokratîk kirin û wek bezandina hêlên sor ên Tirkiyê binav kirin

- Biryar e di Qanûna Saziya Xwendina Bilind (YOK) de guhertin bê kirin û li zanîngehan Enstîtuyên Lêkolîna Kurdî bên damezrandin û dikarin lêkolînan li ser ziman û zaravan bikin.
- Dê xebat bên kirin di xwendingehan de Zimanê Kurdî wek dersa hilbijartî bê xwendin.
- Biryar e rêveberiya Saziya Bilind a Radyo û Televizyonan (RTUK) bê guhertin û destê televizyonên taybet bi tevahî vekirî bên vekirin ku bi zimanê Kurdî weşanê bikin. Dê bikaribin reklaman jî bi zimanê Kurdî biweşînin.
- Gava din ew e ku şiroveya Quranê bi zimanê Kurdî bê çap û belavkirin. Herwiha ji ber ku piraniya Kurdan peyrewên ola şafiî ne, divê Serokatiya Karûbarên Diyanetê zanyariyên li ser şafiîyetê bi Kurdî biweşîne.
- Biryar e ji bo kêmkirina zext û givaşa zêde û berfireh li ser hevwelatiyên Kurd, rêjeya pirsgehên lêpirsîn û lêgerînê di navbera bajarên Kurdistanê bên kêmkirin û ew kar bi awayekî sîstematêk a rêveberiyê bê meşandin.
- Navên gundan dê bên guhertin û navê wan gundên ku kirine Turkî dê bibin Kurdî.
- Biryar e ku guhertin di maddeya 81ê ya Qanûna Partiyên Siyasî de pêk were ku rêgir e li pêşiya bikaranîna ziman û zaravên cuda û rê li pêşiya propagandeya Kurdî dê bê vekirin.
- Gaveke din a pêvajoya vebûna demokratîk, pejirandina protokola rêgirtina îşkencê ya Yekîtiya Ewrûpa ye ku bi vî awayî dê komîteyên lêkolînan ên Yekîtiya Ewrûpa li Tirkiyê bi rengekî hêsantir bikaribin karê xwe bikin û çavdêriya rewşa mafê mirovan li Tirkiyê bikin ku hemû salekê dikeve ber rexneyên Komîsyona Mafê Mirovan a YEê û tê mehkûmkirin.
- Biryar e cerdevanî (sîstema Caşatiyê) li Bakurê Kurdistanê bê hilweşandin û betal bibe û ên temenê wan mezin bûbe tên xanenişînkirin û yên din jî dê bikaribin di saziyên hikûmetê de kar bikin. Ligel wê çendê ku AKP ev pêngav û komek behsên din di vê çarçoveyê de roja sêşem 10ê Mijdara 2009an xist pêşberî Parlamena Turkiyê û me dît ku parlamenterên partiyên opozîsyonê di destpêka nîqaşan de, bi taybet nûnerên her du parityên CHP û MHP wek du dijberên pîşeyî û herdemî ên çareserkirina pirsa Kurd li Tirkiyê çawa dijberiya proseya vebûna demokratîk kirin û wek bezandina hêlên sor ên Tirkiyê binav kirin. Lê ev xal û gelek ên din, çend nimûne ji hûrdekariyên naveroka vê proseyê ne ku APK wek proseya vebûna demokratîk ku hin car jî wek pêvajoya aştiyê û wd... binav dike, kifş û eşkere kirine. Bêguman evna gavên herî kêm û destpêkî ne ku hikûmeta Turkiyê ji bo cihgirkirina aştî, demokrasî û diyalog bo çareserkirina pirsa Kurd li wî perçeyê Kurdistanê dixwaze biavêje. Lê hatne rojeva vê proseyê û van gavên nû û paşdekişyan ji proseya heştê salî a asîmîlasyon û înkarkirina nasname û maf û azadiyên neteweya Kurd bi xwe pozetîv û alîkarê vê pêvajoya nû ji bo xurtbûna demokrasiyê û cihgirbûna aştiyê di wî welatî de ne. Ji ber ku dabînbûna mafên demokratîk ên netewa Kurd di wê beşa Kurdistanê de pêwîstî bi gavên bi bandortir û berfirehtirt ji aliyê hikûmeta Tirkiyê û hûrbîniya çawaniya mifahstandina Kurdan ji wê proseyê heye.

www.arsivakurdi.org

**RONÎ**

Quncikek ji bo şiroveya bûyer û babetan ji xwendevanên "Agirî" re



**Ebdullah Hicab**

# 20 Sal Piştî Dîwarê Berlîn

Roja 10ê meha Sermawezê, rêberên xwedî bandorên cîhanê û gelek ji serokên welatên endam di Yekîtiya Ewrûpa de, 20mîn salvegera hilweşîna Dîwarê Berlîn pîroz kirin. Di merasima 20 saliya hilweşandina dîwarê ku bi dehan salan xelkê Alman ji hev cuda kiribû de, goşeyek ji êş û azarên ku xelkê Alman ji ber avakirina dîwar dîtibûn hate baskirin. Lê, merasimê ji encamên siyaseta ku li pişt Dîwar jiyana xelkê xistî tengasiyê pitir, giranî da pêvajoya ku di meşa xwe de Dîwar da hilweşandin. Dema dîmenên rêûresma bîst saliya ketina Dîwarê Berlîn li ser şaşeya TVê dihate weşandin, hizra min çû cem kalemêrek Almanî ku berî 5 salan min ew li Berlînê dît. Pîremêrê ku min qet nizanî navê wî çi bû, ji şahiyên ku rêberên siyasî ji bo serkevtinên xwe bi rê dixin pir bêzar bû. Ew li ber dîwarek ji têlan li nêzîk Parlemana Alman sekinî bû û hewl dida weke bi xwe dixwaze balê bikêşê ser serpêhatiya qurbaniyên Dîwarê Berlînê. Zistana sala 2004, li kolana Friedrichstraße nêzîk Parlemana Federal a Alman, Reichstag, kalemêrê bê nav, hin wêne bi dîwarekê ve daliqandibûn û ji rêvîngan re basî wan kesayetiyan dikir ku wêneyên wan bi dîwar ve bûn. Digel ku min zimanê wî fam nedikir, lê şêwe û cihê rawestana wî pir balkêş bû û bi bê zimanî mirov dizanî ku ew basî çi dike. Ez li bendê mam heya kesên ku bi kalemêr re dipeyivîn xatir jê xwestin û lê dûr ketin. Paşan ez hinekê lê çûme pêş û min jê pirs kir ka Dîwarê Berlîn li ku re derbas dibû. Bi rastî jî min meraq dikir ka dîwar ji ku re diçû û bi çi awayî karîgerî li ser dîmenên vê deverê kiribû.

Weke çawan tu tiliya xwe li şaneya mozê bixî, kalemêr veciniqî û bi acizî bersiv da: "Ma gelo çi ferq dike ka dîwar ji vir re derbas bibe an ji wir re? Dema ku dîwarek hebe, bêguman an çend mêtran li vî alî ve an jî çend mêtran li aliyê ha ve bûye". Min lêborîn xwest û jê re got ku min hema meraq dikir û çi mebestek min ya din tune bû. Wê demê kalemêr bi destê min re girt û li ser gotina xwe çû: "Ez li te aciz nînim, lê bi tenê meraq dikim ku em mirov çi qas bi tiştên rûkeş re mijûl in! Li wî ciyî dîwarek hebû û li her du aliyên dîwêr mirov dijiyan. Li aliyek dîwêr sîstemek girtî hebû ku jiyan û kiryar û heya hizrên mirovan jî kontrol dikir. Bi dehan ji wan kesên ku hewl dan xwe ji wê rêjîmê xelas bikin, li kêleka wî dîwarî hatin kuştin.

Niha ew kes di nava me da nînin, lê ez her roj xwezî dixwazim kesên ku niha wêneyên bi dîwar ve dibînin, li ciyê ku ji min bipirsin ka dîwar ji ku re derbas dibû, ji min pirs bikin ka ev kesayetî kî bûn, çima hatin kuştin û me mirovan çi ders ji wê dîrokê girt".

Dîwarê Berlînê sala 1961ê, ji bo pêşîgirtin ji reva xelkê Rojhilata Alman bo Rojava hate çêkirin. Rêjîma komunîstî ya Almana Rojhilat ku bi piştevaniya Yekîtiya Sovyet, piştî serkevtin di şerê cîhanî yê 2 yem de, sala 1945 hatibû ser kar, ji ber hegerên siyasî û îdeolojîk hemû warên jiyana xelkê bi tundî kontrol dikir. Bi wê siyasetê re



**Dîwarê Berlînê sala 1961ê, ji bo pêşîgirtin ji reva xelkê Rojhilata Alman bo Rojava hate çêkirin**

girêdayî, her tevgerek ku bi îzna karbidestan neba an bi dilê rêjîmê neba, bi tundî dihate tevşikandin.

Lewma hejmarek zêde ji xelkê Alman bi riya Berlînê re ku nivî di destê komûnîstan û nivî di destê hêzên Rojavayî de bû direvîn û diçûne Almana Rojava. Tê payîn ku tenê di panzdeh salên piştî perçebûna Berlînê de, bi kêmî 3 milyon û 100 hezar kes ji Rojhilat re ber bi Rojava revîn.

Ji ber wê revê, ji karbidestên komûnîstên Berlînê re zehmet bû ku ciyê vala yê kesên direvin di fabrîke û îdareyên dewletî de tijî bikin. Lewra wan hawara xwe ji rêberên Sovyetê re bir. Serokê demê ye Yekîtiya Sovyet, Nikita Xuroşçov dema hêviya kontrolkirina rewşê û bidestxistina kontrola bajarê Berlîn ji dest da, gef kir ku birêveberiya hemû bajarê Berlîn bide dest Partiya Komûnîst ya Alman.

Ev gef berevajî lihevhatina navbera hêzên serkevtî di şerê cîhanî yê 2ê de bû. Ji ber ku piştî şer, biryar bû kontrola Berlînê bi destê hêzên serkevtî di şer de be. Beşa rojhilata bajar di destê hêzên Sovyetê de bû û aliyê rojava jî bi destê hêzên Amerîka, Fransa û Îngilîs dihate birêvebirin. Paşan Sovyetê beşa Rojhilat xiste bin desthilata hevpeymanên xwe yê komunîst û hewl da bi riya Partiya Komûnîst a Alman, hemû Berlînê bixe bin destê xwe. Lê bi ser neket. Bajarê Berlînê bi du beşên cuda bû meydana dijberiya navbera Komunîzm û Kapîtalîzmê. Lê di heman demê de jî bûbû delaqeyek ji bo xwe derbaskirina dijberên rêjîma komunîstî. Ji ber ku hemû bajar di nava wê herêmê de bû ku ji aliyê Sovyetê ve dihate birêvebirin, lê bajar bi du beşan hatibû perçekirin û beşa rojava bûbû bingeha xurtya serbazî bo hêzên Amerîka û hevpeymanan. Ji sala 1949 û pêve hêdî hêdî bajar ber bi perçebûna fîzîkî ve çû û hewl hate dan bi yekcar pêşiya hatin û çûna xelkê ji rojhilat re bo rojava bê girtin.

Dema ew pêngav bi ser neket û komunîstan nekarî rê ji hatin û çûna xelkê bigrin, Partiya Komûnîst ya li ber fermana Sovyetê, biryar da ku bi fermî bajarê Berlînê bike du beş. Ev parvekirin dibû bi awayekê be ku bi awayê fîzîkî pêşiya reva xelkê bigre. Serokê şaredariya mezin a bajarê Berlîn, Willy Brandt hemû hewl da ku berayîka avakirina dîwar bigre, lê bi ser neket.

Rêjîma komunîst ya Almana Rojhilat bi navê "parastina li hember Faşîzmê", ew dîwar ava kir, lê ji ber ku dîwar pêşiya hatin û çûna azad ya xelkê digirt, xelkê Almana jê re digot "Dîwarê şermê". Dîwarê Berlîn yê 106 kîlometr dirêj û 3,5 metr bilind, bi fermî roja 13 ê Gelawêja 1961 re hate avakirin û heya 9 ê Sermaweza 1989 li ser piyan bû. Di salên navbera 1961 û 1989 de, tê payîn ku bi kêmî 5000 kesan hewl da astengiyên ser riya reva ji Rojhilat rakin û bi derbasbûn ji Dîwarê Berlînê xwe bigehînin Almana Rojava. Lê Dîwarê Berlînê ji wan re bû Dîwarê mirinê. Ji wan kesan, tê payîn ku bi kêmî yek hezar kes hatibin kuştin. Balkêş e ku di wê demê de bi tenê yek kesî jî riya berevajî neceriband.

## Biryara Îdamkirina Şêrko Mearifî Hat Sekinandin



Dr. Xalîd Behramiyan Parêzerê Şêrko Mearifî di hevpeyvîneke de digel beşa farsî ya BBC'yê de ragihand, biryara îdamkirina Şêrko di girtîgeha bajarê Seqizê de hatiye seknandin. Behramiyan da zanîn: Wî kariye li gor yasayên dezgehên dadê daxwaza dubarebûna dadgehîkirina Şêrko bi beşdariya çend dadweran pêk bîne û herwiha di wê derbarê de kariye bala berpirsên bilind yên dezgeha dadê ji bi dest bîne.

Li gor zanyariyên wê dawiyê yên kampayna piştgirî li girtiyên siyasî û sivîl, Şêrko Mearifî di Qrentîneya girtîgeha bajarê Seqizê de bo hepsa giştî hatiye veguhartin û heta dawiya dadgehîkirina dubare, metirsiya îdamkirina Şêrko tune ye.

Herwiha Rêxistina Lêborîna Navneteweyî di daxuyaniyekê de daxwaz ji berpirsên rejîma Komara Îslamî a Îranê kir, ku bilez biryara sepandî bi ser Şêrko Mearifî ku bi tometa "Muharibe" bê rêya endametî di rêxistineke Kurdî de bi îdamê hatiye mehkûmkirin, hilweşîne.

## Pênc Ciwanên Bajarê Seqizê Bi Cezayê Girtîgehê Hatin Mehkûmkirin



Dadgeha Şorişa bajarê Seqizê di heyamê heftiya borî de biryara girtîgehê bi ser pênc ciwanên bajarê Seqizê de sepand.

Li gor rapora Nûçegihaniya Kurdistan, ew pênc ciwan çend meh berî niha ji aliyê dezgeha ewlekarî ya rejîma Îslamî a Îranê bi tawana hevkarî digel partiyên Kurdistanî yên dijberî rejîmê hatibûn girtin.

Li gor wê tometê Hêmin Fatihî bi du sal cezayê girtîgehê û Hîwa Azerî, Eta Erdengî, Xalîd Ezîzpûr û Davûd Riyahî her yek ji wan bi salek cezayê girtîgehê hatine mehkûmkirin.

## Şewba Berazan Jiyana Ciwanekî Li Tîkabê Stand



Roja 11ê Çiriya Paşîn a 2009'an, ciwanekî bajarê Tîkabê yê temen 23 salî bi sedema nexweşiya Şewba Berazan jiyana xwe ji dest da.

Nûçegihaniya Kurdistan di vê derbarê de ragihand, ew ciwane ku di madena zêr ya bajarê Tîkabê de kar dikir, çend car serdana nexweşxaneya giştî ya bajarê Tîkabê kiribû, lê bi sedema tunebûna taqîgeh û alavên taqîkariya nexweşiya Şewba Berazan di wî bajarî de, nehatibû zanîn ku navberî nexweşiya Şewba Berazan heye. Piştre di taqîgeha zanîngeha bajarê Tehranê de eşkere bûye ku wî ciwanî nexweşiya Şewba Berazan hebûye.

Hêjayî gotinê ye ku di bajarê Tîkabê de çend kesên din tûşî nexweşiya Şewba Berazan bûne. Lê bi egera tunebûna taqîgeha diyarîkirina wê nexweşiyê di Kurdistanê de, egera mirina tûşbûyên bi wê nexweşiyê zêdetir e.

Nûçe û dengûbasên nû û rojane derbarê Rojhilatê Kurdistanê li ser malpera kurdistanmedia.com bixwînin...
www.kurdistanmeia.com >>>

## Mafê Mirovan



Nivîsîn: Peter R. Baehr
Wergeran: Mecîd Heqî

## Rola Mafê Mirovan Di Siyaseta Dereve De

Ji aliyekî din jî xwasteka bi hev re karkirinê dikaribe hin bandorên nerênî jî hebin. Bo mînak li gor hinek karnasan, dewleta Holanda gellek zû poşmanbûna xwe li şikayeta dewletên Ewrûpî li dijî Tirkiyê ji bo poşmanbûna dostane li cihên dagirkirî di sala 1985an de ragehand. Ew rexne lewma tê girtin, ji ber ku Tirkiyê karek berçav di warê baştirbûna mafên mirovan de nekiribû û pirr bi hêsanî li wê tawanê derbaz bû. Mînaka duyem hewla hinek welatên Konseya Ewrûpa ye ku Holanda jî yek ji van welatan bû bo ambargoyan li ser Afrîqaya Başûrî bo pêşgîrîkirin li hatina reojûya Afrîqa bo Ewrûpayê. Almanya û Purtogal du kirryarên herî mezin ên rejûya Afrîqaya Başûrî bi awayek serkevtiyane li dijî wê helwêstê bûn. Di wê nimûneyê de berjewendiyên rasterast ên abûriya hin welatên Ewrûpî rêya pesendkirina ambargoyê li ser Afrîqaya Başûrî bi dengê zorayetî di Ewrûpa de girt.

Daxuyaniyên giştî li parlamen an jî li rêxistineke navnetewî weke Neteweyên Yekgirtî ji bo bikaranîn di hundirê welat de ne. Jo bo wê ye ku gotina Serokkomar Ronald Reygan li civîna bilind digel Mixaîl Gorbaçov – serokê Sovyeta berê – di sala 1987an de li bajarê Reykjavík ku ragehand, ew dê giraniyê bide rewşa mafên mirov û Cihûyên (yehûdî) Soviyetê di wê çarçovê de tê dîtin. Daxuyaniya piştî civîna bilind gellek bi kêmî basa wê mijarê dike. Ragehandina serok Reygan bi giranî bi armanca bersîvdan bi xwasteka raya giştî ya Amerîka bû. Daxuyaniya giştî ji bo wê ye ku kesek bixwaze pêşerojê bo piştgirî li axaftinên xwe amajê pê bike. Her wisa ewa nîşana nermiş û kêrhatîbûna guhertina siyaseta dewletan e.

Li Rêxistina Neteweyên Yekgirtî dewletek endam dikare rolek aktîv hilbijêre, bo mînak di Komîsyona Mafê Mirovan de. Lê ger dewletek endamê komîsyonê jî nebe, dikaribe wek zêrevan beşdarê civînan bibe û dîtinên xwe ser pirsên giştî yên mafê mirov an mafê mirov di welatek taybetî de bîne ser ziman. Ew dewlet renge bixwaze wek zêrevanê mafê mirovan xwe bide naskirin. Handanek wilo dikare li Komîteya Sêyem (ji bo kar û barên civakî û çandî) cîh bigire, ku tayek (şaxeyek) li Civata Giştî ya Neteweyên Yekgirtî ye û têde rewşa mafê mirovan dikeve ber nîqaşê.

Têkdan an paşdexistina serdana wezîran li welatekê dikaribe derbirîna rexne û gazinde li wî welatî derbarê rewşa xirab a mafê mirovan be. Serdana wî wezîrî her wisa dikaribe bo wê armancê jî pêk bê, herçiqas ewa daxwaza balpêdan û lênêrînên kûr derbarê hesasbûna pirsê dike. Dewleta xanexê bi giştî hez ji wê yekê nake ku pirsên mafê mirov an pirsên navxweyî ên welat ji aliyê dewletek biyanî bikeve berbasê. Daxuyaniyên fermî dikaribe li hundirê welat bên piştgîrîkirin, lê belkî ew pêşwazî li welatên derve neyê kirin. Di rewşek wilo de ku li welatekê rewşa mafê mirovan xirab e, di dema serdana wî welatî de divê gelek balê bidinê, ji bo ku welatê xwanexwê sûd û fêdeya xirab ji bo pêşvebirina siyaseta xwe li wê mêvandariyê wernegire.

www.arsivakurd.org

# Jin Di Pêvajoya Sedsala Nû De

**Yesna**

Em îro di sedsalekê de dijîn ku bi fakter û taybetmendiyên pêşkevtî wek sedsala pêşketin, teknolojî û enformatîkê tê naskirin. Hemû pêkhateyên civakan û normên jiyana mirovan ketine bin banora taybetmendiyên vê sedsalê û karwanê teknolojî her tişt xistiye bin bandorên xwe ên erênî. Her ku diçe jiyan nûjentir û civak pêşketîtir dibin û di her warî de guhertinên lezgîn tên dîtin. Ger em lênêrîneke kurt li derdora xwe bikin, bi eşkere tê dîtin ku hêj em di destpêka dehsala yekem a sedsala 21an de ne, lê ev qas pêşketin û guhertin di vê dema kin û kurt di jiyana mirovahiyê de çêbûne.

Lê ligel van hemû guhertin û pêşketinan û berdewambûna pêvajoya sedsala teknolojî û zanistê, hêj gelek pirsgirêkên kûr û mezin di jiyana jinan wek nîva pêkhateya mirovahiyê tên dîtin. Kirîza herî berçav ku bandor kiriye/dike ser hemû warên jiyana jinê, hebûna ne wekhevî û cudahiyan di navbera wan û mêran de di hemû warên jiyanê de ye. Ev rewş bûye sebeb ku heta niha jî jin di çarçoveya rêxistin, sazî û komeleyan de ji bo bidestxistian mafên xwe yên binpêkirî û ji holê rakirina cudahîdanan û ne wekheviyan û cihgirkirina wekheviyê di civakê de xebatê bikin.

Li gor lêkolînên ku Neteweyên Yekbûyî û saziyên din ên navneteweyî encam dane û nirxandinên xwe dane xuyakirin; hêj jin nikarin bi awayekî wekhev û yeksan wek mêran îmkanat û derfetên di warên siyasî, abûrî, civakî û perwerde û wd... de hebin û bidest bixin.

Armanca sereke a ji holê rakirina ne wekhevî di navbera jin û mêran de baştirkirina rewşa wan ji bo gihîştin bi jiyaneke mirovî û salimtir û wekhevtir e. Ev armanc demekê tê bicihanîn ku hemû tex û qatên civakê li xwe bigre û tevahiya grûbên curbicur ên civakî ji her du zayendan tê de beşdar bin. Ji ber ku jin nîva her civakekê pêk tînin, lewra tu bername û pilanek bê giringî û baldan bi jinan nikare serkeftinek berbiçav bidest bixe û di encam de tu pêşketin û pêşdeçûnek nikare bê wekheviya jin û mêr berdewam û kemilî be.



***Pêwîst e hemû pêvajoyên bername û pilandanîn û herwiha biryardanê derbarê jiyana siyasî, abûrî û civakî a civakan di sedsala 21an de, jinê wek hêza çalak û xwedî şiyan û bi bandor berçav bigrin***

Konvansyonên navneteweyî destnîşan dikin ku divê derfet û îmkanên yeksan di navebra jinan û mêran de di van warên jêr de pêk were: Karkirina wekhev, yeksaniya navebra jinan û mêran û bidestxistina firsendên abûrî, siyasî, perwerde û çavdêriyên tendurustiyê. Di rewşeke wiha de ku cîhan ji bo bidestxistina wekhevî û pêkanîna rewşeke adîlane û guncaw digel jêhatîbûna takekesan di warên abûrî, siyasî û civakî de dimeşe, lê bi nihêrîneke kurt bi ser rastiyan, mirov dikare gellek dîmen û nimûneyên xuya û berçav temaşe bike ku vê rastiyê derdixin holê, hêj bêparî û ferq û cudahîdanan li dijî jinan di astên cubicur de bi awayekî berfireh dimeşin. Ji bo fehmkirina vê rastiyê pêwîst e em nimûneyekê bas bikin: Li gor rapor û statîstîkên Rêxistina Neteweyên Yekbûyî, du ji sê a nifûsa cîhanê a temendirêj a nexwendewar û bêpar û belengaz jin pêk tînin. Ev mînak vê rastiyê eşkere dike ku hêj di cîhanê de, nemaze li welatên cîhana sêyem, bêparkirin û ferq û cudahî bi sedema zayendî dom dike û bûye çavkaniya eşkere a ne wekheviyên civakî.

Di welatên cîhana sêyem û bi taybet Rojhilata Navîn de, ne wekhevî ji bo jinan dijwartir e. Bi taybet di civakekê de ku îdeolojiya mêrserdestiyê zal be û mêr serdest bin, jin di warê karkirin, dahat, xwendin, beşdariya siyasî û civakî di gelek warên din ên civakê de, rêjeyek ji mêran kêmtir û jêrdetir hene. Tenê mekanîzmek dikare vê rewş û pêvajoyê ji holê rake û bibe ewle û garantî, ew jî beşdarîkirina herçiqas zêde a jinan di hemû astên civakî de wek mêran û herwiha beşdariya bi bandor a wan di civakê de ye, ji ber ku ew pêvajo bikare edaleta civakî û abûrî cihgir bike û bê çewisandina zayendî her takekesek rolê xwe yê pêwîst û sereke bilîze.

Pêwîst e hemû pêvajoyên bername û pilandanîn û herwiha biryardanê derbarê jiyana siyasî, abûrî û civakî a civakan di sedsala 21an de, jinê wek hêza çalak û xwedî şiyan û bi bandor berçav bigrin. Ji bo dabînbûna vê yekê, pêwîst e zamîne û derfetên siyasî, abûrî û civakî ên minasib û jêhatî pêk bên da ku jinan bikarin ji firensd û îmkanan mifahê werbigrin û di encam de ew siyaset û gav û kiryarên ku bûne sebeb ku ferq û cudahî li hemberî jinan çê bibin, bi tevahî ji holê rabin û edaleta civakî di civakê de cihgir be.

www.arsivakurdi.org

## Ji Bo Qedexekirina Sinetkirina Jinan Kampaynek Navneteweyî



**Agirî – BBC:** Hefteya borî li welatê Borkînafaso li Afrîqayê, konferanseke navneteweyî derbarê sinetkirina jinan hat lidarxistin. Di vê konferansê de hevsera Serokê Borkînafaso Çantal Kumpare, ragehand, divê welatên Afrîqayê ji bo qedexekirina ‘jêvekirina endama laşê jinê’ hewlên zêde bidin. Çantal ji welatên Afrîqayê daxwaz kir ku ji bo rawestandina bilez a jêvekirina endama laşê jinan di kampayna li dijî wê diyardeyê de beşdar bin. Herwiha di wê konferansê de ji Neteweyên Yekbûyî jî hat xwastin ku di derbarê sinetkirina jinan de biryarnameyekê bide.

Li gor rapora Rêxistian Tendurustiya Cîhanî, sinetkirina jinan tundûtûjî tê hesibandin û bi sedemên çandî û olî li hinek welatên Afrîqayî, Asyayî û Rojhilata Navîn rêve diçe. Ev kiryar dikare tendurustiya jinan bi tevahî bixe xeterê û di encama wê kiryarê de gellek pirsgirêkên xurt ji bo tendurustiya wan jinan pêk tê.

Rapora Rêxistina Tendurustiya Cîhanî texmîn dike ku qasê 100 – 140 milyon jin li sernaserê cîhanê rastî vê kiryarê hatine. Li gor rapora Neteweyên Yekbûyî jî, salane 3 milyon keç li Afrîqa di metirsiya sinetkirinê de ne.

Li Rojhilatê Kurdistanê, di çend bajaran de hêj keç tên sinetkirin. Li gor raporên rêxistinên parêzerên mafê jinan li Rojhilatê Kurdistanê, temenê wan keçên Kurd ku tên sinetkirin, 4 heta 6 sal e.

## Berdan Gefek Mezin Bo ser Civaka Parêzgeha Îlamê



Yek ji pirsgirêkêln bingehîn ku her 4 parêzgehên Rojhilatê Kurdistanê pê re rûbirû ne, kirîza berdan an ji hev veqetiyana jin û mêran e. Di daxuyaniyeke nû de, Rêveberê Rêxistina Netewî a Ciwanan li Parêzgeha Îlamê ragehand: Pirsgirêka telaq an berdanê li gor nifûsa kêm a Parêzgeha Îlamê her ku diçe, zêde dibe.

Rêveberê Rêxistina Netewî a Ciwanan li Îlamê Ebas Heyderîpûr, di konferanseke çapemeniyê de diyar kir ku li gor qasê kêm yê nifûsa Parêzgeha Îlamê, lê di vê parêzgehê de serjimêriya cudabûna jin û mêran ji hev roj bi roj zêde dibe û ev diyarde niha xetereke mezin a civakî bo ser jiyana hevwelatiyan li parêzgeha Îlamê tê hesibandin.

Li gor lêkolîn û serjimêriyên herî nû, parêzgehên Kurdistan, Kirmaşan û Îlam piştî Tehranê di rêza herî pêş a wan parêzgehên Îranê de ne ku herî zêde berdan têde çêdibe. Jin û mêrên ku ji hev vediqetin, di navbera temenê 24 – 25 saliyê de ne. Ji ber pirsgirêkên civakî û aborî û wd.. li Îranê, kirîza berdanê roj li pey rojê xurt û berfireh dibe û hikûmet tu hewlekê ji bo çareserkirina bingehîn a wê diyardeya civakî nade.

**Agir- Beşa Civakî**

## 91 Xwendekarên Zanîngeha Bajarê Urmiyê Di Lîsta Reş Ya Parastina Zanîngehê De Hatine Cihkirin

Kurdistanmedia: Piştî Şanogeriya îsal a hilbijartinên Serok Komariyê li Îranê di destpêka meha Îlna îsal de, lîsteyekî reş ji navên wan kesan hatiye amadekirin ku piştî wê hilbijartinê di zanîngeha bajarê Urmiyê de, bi gotina wan wek têkder hatine naskirin, ew lîst bi berpirsên wê zanîngehê hatiye dan.

Nûçegihaniya Kurdistan di vê derbarê de diyar kir, ew lîsteya reş ku ji aliyê Beşa Parastina zanîngehê bajarê Urmiyê ve hatiye amadekirin, 91 xwendekarên wê zanîngehê ku di xwenîşandanên nerezîbûnê piştî hilbijartinan de beşdariyek çalakane hûebûne ji xwe digre.

Beşa parastinê ji berpirsên wê zanîngehê re ragihandiye, ew kesên ku di wî lîsteyê de ne hewcehiyên xwendinê wek xewgeh, deyna xwendin û xwendekariyê bêpar dibin.

Hêjayî gotinê ye ku ew lîste bi awayekî ne fermî û nepenî bi berpirsên zanîngeha bajarê Urmiyê hatiye dan.

### Swêd Welatek Ku Bi Jinan Birêve Diçe



Swêd yek ji welatên pêşeng ên cîhanê ye ku herî zêde wekheviya navbera jin û mêran têde tê Parastin. Di vî welatî de zêdeyî her ciheke din li Ewrûpayê jin di warê rêvebirinê de gotina yekem dikin. Ji bo vê pêvajoyê li Swêdê sazî û rêxistinên civakî û sivîl rolek mezin û bi bandor dilîzin.

### Li Îraqê Banka Taybet Bi Jinan Hat Vekirin



Li Îraqê Banka taybetî a Babil, demekê berî niha tayek bankî a taybet bi jinan li bajarê Necefê vekir, hemû 25 karmendên vê taya Banka Babil jin in û tenê jin dikarin serdana wir bikin. Hêzên sekolar ên Îraqê bi xurtî li hember vekirina banka taybet bi jinan dijberiya xwe dan xuyakirin û aliyên olî û kevneşop jî pêşwazî jê kirin.

### Mêrek Nêzîk 100 Sal Ji Jina Xwe Mezintir E



Li Welatê Somalî yê Afrîqî, sedan kes di daweta mêrekî 112 salî de beşdar bûn ku keçeke 17 salî anî. Navê wî kesî Ehmed Mihemed Dur e ku ji 5 jinên berê 18 zarok çêkirine û dixwaze ji vê keçê zêdetir zarokan çêbike. Di sedsala borî de ev yek ji xalên bê mînak ên pêkanîna jiyana hevbeş bûye.

www.arsivakurdi.org

# TENGEZARÎ



ADAR JIYAN
adarjiyan@mynet.com

Gelek caran diltengî, zorayî û zehmetiyên jiyanê, kepisandin û tepisandinên civakî dibin sedema tengaviyên takekes û civakê yên derûnî û komelî. Boran û tengaviyên derûnî û komelî jî dibin sedema rûdan û teqîniyên gerdûnî.

Îro tevê dinê bi saya geşedaniyên zanistî û alavên teknolojiyê bûye nola gundekî biçûk. Ku li devereke cîhanê bûyerek diqewime, tevê mirovan di heman katê de bi wê bûyerê dihesin. Mirov di heman gavê de ji rûdan û geşedaniyan nû agahdar dibin. Nêrîn û dîtinên xwe yên derbarê bûyer û lêqewmînên dinê diyar dikin û li gorî wê helwest digirin an tev digerin.

Jiyana takekes û civakê ya komalî li gorî şêwaza hilberiyê ango li gorî rewşa aborî teşe û dirûv digire. Pergal û sazûmanên jorxane, her gav li ser hîmê sazûmanên jêrxan ava dibin. Sazûmanên jêrxane û jorxan çi ne, divê em wateya wan bizanibin û peyre li ser hevhîkariya wan hinekî rawestin.

Pergala rêveberiyê û şêwaza hilmeriya civakê çi be an bi çi awayî be, sazî û dezgehên jorxane yên mîna çand, huner, wêje, perwerdehî, spor, ol, sinc, exlaq, gertev, dab û nêrît û kevneşopiyên civakê jî bi heman awayî dê bi wî rengî bin. Bo nimûne; pergala civakê ya komelî û saziya jêrxane kapîtalîst be, dê hemû sazî û dezgehên civakê li gorî pergala kapîtalîst; na heke pergal sosyalîst be dê hemû sazî û dezgehên jorxane jî li gorî pergala sosyalîst dirûv bigirin.

Bêguman, bi qandî pêdiviyên rojane yên mîna xwarin, vexwarin û vehesînê, hewcedariya mirov bi tevger û bizavên çandî û hunerî û her wiha çalakiyên cestî û derûnî yên komelî jî heye. Wekî spor, şano, muzîk û wêne û hwd. Belê divê ev çalakî hemû di suxreya mirovahiyê de bin û ji bo tenduristiya mirov û civakê bêne kirin. Ne ku ev tişt bibin sedema kuştin û xwekuştina mirovan û navgîna arîşe û aloziyên civakî. Spor, kirûyeke pir girîng û sûdewar û heta bêbes manîdar e. Belê bi çi rengî ? Bi wî şertê ku mirov bixwe sporê bike, cest û lemlateyên xwe bixebitîne û tenduristiya xwe biparêze.

Ji werzîşê (sporê) bigirin heta muzîkê, ji muzîkê bigirin heta şanoyê, ji şanoyê bigirin heta sînema û wenesaziyê, her tişt li dijî tenduristiya mirovan tê xebitandin û bikaranîn. Îro ev çalakiyên çandî û hunerî hemû di xizmeta mêtingeriyê de ne. Her yek ji wan wekî alaveke tiryak û tevzîner di dil û mêjiyê mirovên ciwan de diçêre û wan ji hest û bestên mirovî bidûr dixe. Ji van alavan yek jê pêgog (futbol) e. Pêgog, îro wekî şehr û tiryaka hemdem e. Hem jî ew tiryaka ku ji timika serê mirovan heta bin pehniya wan şane bi şane ditevizîne ye. Lewre em dibînin ku ji mirovên desthilatdar ên ku her devekî wan tiştekî dixwe bigirin heta yên ku li gezanên hesilîne, ji dewlementirînê cîhanê bigirin heta xizan û belengzên dinê, tevê mirovan daye dûv goka gilover ya ku carekê tenê pihêna wan pê nebûye û bi gogvanan re radibin û rûdinên, vir de û wir de dipekin. Ew goga şehrîn hiş di serê kesî de nehiştiye. Tu dibêjî qey tu arîşe û pirsgirêkên dinê tune ne ku mirovahiyê daye pey wê goga gilover a ku dişibe dinayaya me ya yekreng û yekdeng...

Wekî ku li jorê jî hate diyarkirin, pergala cîhanê bi çi rengî be, çand û huner û kevneşopiyên civakan li gorî wî rengî teşe digire. Ku pergala dinê kîjan heng, bezm û şahiyên civakî li ser mirovan ferz dike, mirov jî arasteyî wan tiştan dibin. Îro em dinêrin serjimara dinê li dora şeş mîlyaran ediliye. Yanî şeş mîlyar mirovên dinê ji destê hêzên desthilatdar û pergala kapîtalîst di emana Xwedê de ne. Her tişt li ser riknê vê pergala kerex û kambax hatiye rûnandin. Pergala Cîhanê Ya Nû, pirsgirêkên nû û pirsgirêkên nû jî mirovên nû diafirîne. Cîhan ber bi yekreng û hemdengiyekê de diherike. Xweza û gerdûn bi xwe jî her gav li hemberî hemerengî û hemdengiya çêkirî derdikevin; belê tenê mirov ji bo pirerengî û piredengiyên ku bi destê serdestan hatine çêkirin, bêdeng dimînin. Bêdengiya mirovan dibe sedema tepisandin, çewisandin û kepisandinên mirovahiyê. Ev jî dibe sedema tengavî xurifandinên nû.

Roj tune ye ku li ser rûyê erdê bi sedan mirov neyên kuştin. Dîsa gav nîn e ku li quncikeke dinê xwekuştinek pêk neyê. Mirov li dewsa jiyan û vejiyanê, kuştin û xwekuştinê dineqînin. Ji pêgavî û neçarî, mirov radibin li şûna lihevhatin û lihevkirinê, an şer û pevçûnê; li şûna dilxweşî û aramiyê jî, diljarî û xemgîniyê dipejirînin. Ev tişt hemû jî ne delîlên xêr û xweşiyê ne. Wekî ku pêşiyan jî gotiye: "Berî baranê ba tê, berî mirinê ta tê" Ev neyîniyên ecêb hemû nîşaneyên tengaviyên gerdûnî yên xeter û erjeng in.

Wekî ku Dryden dibêje: "Ji tengezariya mirovên bisebir bitirse."

Kaniya Helbestan

## Negrî Şehîd

Dildar Îsmaîl 11.11.2009




Negrî dilê min li ser te dinalê û dikelê
Hey Ihsanê delal û ciwan
Negrî û birîna te dimîne nîşan
Çara zor û sitemkariyê her bê çare ye
Tu dibî şehîdê kurdistan
Dijmin dijmine didê ber hev
Zarok û kal, keç û xort
Bi hovîtî didê ber xwe û bi pêlavan
Didê ser gul û çîçekên buharê
Buhara ku hê ne hatiye der
Bi beyive hey Ihsanê delal û ciwan
Rêça te dimîne doz û berxwedan
Peyvên te dibin bersivên gelek pirsan
Negrî û ez xweş dizanim ku giriyê te
Ji nava dile ne bi çavên sor û şile
Dijmin xwînxware wekî Dûpişk û mare
Qet nas nake dostanî û mirovatî
Herdem dimîne wekî hov
Nasnake ne insan û ne ol
Didê ber hev çep û rast
Dikenê û li ser xwînê dikê dîlan
Dikenê û difroşê ojdan
Negrî hey Ihsanê delal û ciwan
Tu dimînî şehîdê kurdistan
Bi navê te şiyar dibin hezarê xortan
Ne daliqandina sîdaran û ne kuştina fîşekan
Gavekê bi paşve dikşîne
Kurdistan dimîne xewna hemî kurdan
Hêviyê dijwar dike
Tenê em dixwazin aştî, biratî û dostanî
Kuştinê em naxwazin em tên kuştin
Em diaxivin axivtinên me tên birîn
Em naxwazin xewna bibînin
Ji bona xewna her em têne girtin
Ji bona nerînên xwe em tê zindankirin
Nerîn û xewin dimînin qedexe
Hêvî û daxwaz qet ji mer nabe
Dijmin weha dixwaze… û
Em weha dibînin
Ihsan di dilê her kurdekî de sax dimîne
Dibe şehîdê kurd û Kurdistan
Ev helbest ji bona Ihsan Fetahiyan

www.arsivakurd.org

# Şiroveya Gotinên Pêşiyan

**Beşa 5**



**Çiya Mazî**

Vegotina bi peyv û axaftinê (pirs û bersiv): Di hinek gotinan de him pirs heye him jî bersiv hatine dayîn. Wekî mînak:

*Kê mirî vegerand? Yên dil kirî.*

*Kê nexweş rakir? Kê ku pirs kir.*

*Kê tir kir? Yên bê dê û bav.*

Van gotinana selmandina bûyeran in.ji bo rexneya li civak û kesan hatine gotin.

Vegotina Çîrokî : Hinek gotin hene, bi awayê vegotina çîrokê hatine gotin. Ew jî carinan dirêj û carinan bi pirs û bersivan çêbûne.

Mînak:

*Di mala bavê de zeynet in,ava cêrên wan şerbet in,dayik dimirin, zeyî tên, "jinbira bê rûmet" in.*

Ev gotin bi awayê helbestî jî tê zimên. Mirov ji çîroka vê gotinê jî wateya keçên ku dibin bûk û rewşa wan, dibîne.

*Ji kerê re gotine were dawetê,gotiye: Ditirsim, bar mar li erdê ye, nigê min ne nigê dawetê ye.*

Di vê gotinê de raste rast vegotina diyalogî heye û ev rêbaza çîrokê ye.

Vegotina Mecazî û pêwendî: ji xwe taybetiya herî bi bandor mecazîbûna peyvên di nava hevokên gotinên pêşiyan de ne. Ev taybetî taybetiya sereke ye. Lê belê ne ku giş bi mecaz in. Hinek henin ev kêmanî di wan de heye ku tenê selmandin in û xwerû nin. Hinek jî henin bi mecazbûna wan wateyeke kûr î nexuyayî tînin holê.

Mînak:

*Cêr li rêya avê dişkê.*

Mirov dikare gelek wateyan ji vê peyvê derxe. Cêr bi tena serê xwe mecaz e. Wekî "mirov" xuya dibe. Mirovê here şer dê bimire jî. Cêr, wekî amûran jî xuya. Amûr, di çi karî de bê bikaranîn, di wê derê de xera jî dibe.

*Ceh qet nebûye genim.*

Ji xwe ceh nebûye genim. Lê ceh di vê derê de watayên din jî xuya dike. Wekî, "jin nabe mêr", "sewal nabe mirov", "mirovê baş tu car xerabiyan nake" û hwd. Di van gotinana de her tişt bi tişteyên din re hatine têkildarkirin û şibandin.

Vegotina xeberbazî û qerfokî: Hinek gotin jî henin, dema têne gotin wekî ku mirov qerfê xwe bi hinekan bike, têne fêmkirin . Ev yek jî wêjeyî û mecazî ye.

Mînak:

*Yê ku herin masiyan, qûna wan şil dibe.*

Vegotina duwateyî (tewriye): Di hinek gotinan de, hinek peyv hene ku bi du wateyan jî têne bikaranîn. Mirov bi kîjan wateyê jî fêm bike taybetiya gotinê naguhere û herdu wate jî di cîh de ne.

Mînak :

*Berxê nêr, ji bo kêr.*

Peyva "kêr" mirov dikare bibêje him di wateya "kêrê" û him di wateya kêrhatinê( karê nêrbûnîyê) de hatiye bikaranîn. Berxê nêr ji bo gonxwarina mîhan tê hilanîn. "kêr" di vê gotinê de tê wê wateyê jî. Lê ev wate di xwendina gotinê de nayê bîra mirov. Ji ber ku ew wate wateyek dûr e. Pêşî wateya kêra birînê tê bîra mirov.

Vegotina hevnegirtî (bi nakokî): Hinek gotin hene ku bi nakokiyê, wateyan derdixin holê. Ji dijberiyê (tezatê) sûdê distînin:

Mînak:

*Li zik xistine, gotiye ax pişta min.*

Di vê derê de "pişt" ne ew pişta bedenê ye, pişta hêz û piştgiriyê ye. Wekî kesekî ku alîkariya wî bike tune ye an kesekî jê re bibe piştgirî tune ye.

Vegotina Remzî (sembolî): Vegotina remzî, di gotinên pêşiyan de taybetiyek giring e. Bi taybetî tişt (obje) bi awayê sembol hatine bikaranîn. Her tiştek bi piranî di gotinan de dibe remz û derdikevin pêşberî mirov. Wekî, dar, wekî, sewal, wekî beşên bedena mirov û hwd.

Mînak:

*Hespê çê, ço li xwe naxîne.*

*Ji mişkan dikevin hebangûşk.*

*Dara xebatkaran tim bi ber e.*

Di van gotinana de: "Hesp", "mişk", "hebangûşk" û "dar", her yek remzek e û ji dêleva tiştekî din hatine gotin. Mînak "hesp", di wateya mirovên baş û jêhatî de hatiye bikaranîn . Heke mirov jêhatî be, mirov nahêle tahde bigihêje mirov. "Mişk" jî di wateya mirovan de ye. Ew jî, ku mirovê nebaş be, zarokên nebaş ji wan çêdibe. "Dar" jî di wateya berhemê de ye. Mirovê xebatkar berhemê wan her bi heyîn û dewlemend e.

DI GOTINÊN PÊŞIYAN DE PEYDEKIRINA "RAMANA BINGEHÎN"

Her gotinek pêşiyan di heman demê de ramanek bingehîn e. Ji bo mirov ramana bingehîn bibîne divê mirov hinekî li ser hûr bibe. Di her gotinê de du hêmanên bingehîn hene:

a) Ramana xweser (Ramana hundurîn)

b) Dîtin. (Dîtina mirovan ya ji bo bûyerê)

Ramana Xweser (ramana hundurîn) :Ramana xweser, hêmana bingehîn e, xala esil a mijarê ye. Ya, dê bê ravekirin e. Bersiva pirsa "ev çi vedibêje?" ye.

Raman: Daraziya ramana xweser e, sînorê wê ye. Bersiva pirsa"bi çi û çawa hatiye ravekirin?" e. Ji bo mirov ramana xweser fêm bike, mirov dikare ji "kirde" û "pêveber"a hevokê sûdê wergire. Kirde(özne), û yên wê temam dikin; xweseriya ramanê, pêveber(yuklem) û yên wê temam dikin jî dîtin û felsefeya mirovan û ya gotinê derdixin holê.

Mînak: *Yê ku ket golê ji baranê natirse* (wateya mecaz; yê ku karekî bike , ji rîska wî natirse)

Pêveber:Natirse. Bi çi hatiye ravekirin,bi golê hatiye ravekirin.Gol cihê nepen e, cihê fetisandin û mirinê ye. Rîsk e.

Kirde: Çi natirse (yê ku dikeve golê). Yê wê rîskê dide ber çavê xwe. Yê ku kar dike ye. Yê ku ji golê natirse, ji rîska kar jî natirse.

Ku mirov kirde û pêveberê bide ber hevdû û wan veguhezîne jiyana asayî, mirov dê bibîne ku çi dibêje.

Ango, ji fetisandina golê, rîska (îflaskirina) kar tê fêmkirin. Yê ku dikeve goiê jî, yê ku dest bi karekî dike ye.

CÛDAHÎYA BÎWÊJ Û GOTINÊN PÊŞÎYAN:

Biwêj: Di ferhengên Ewropî de li himber biwêjan wekî "îdiom" derbas dibe. Di Tirkî de; "deyim" û di erebî de "tabîr" derbas dibe. Di ferhengên Kurdî de; pêgotî an tebîr û biwêj derbas dibe.

Wateya biwêjan ya wêjeyî jî; peyv an hevokên bi mecaz in. Raweya wan û gotinên pêşiyan hinekî kûr û dirêj e. Biwêj jî bi dîroka xwe ji alî pêşiyan hatine gotin û afirandin. Ji ber peywîra wan û gotinên pêşiyan, ji ber cûdabûn û bilêvkirina wan, ji hevdû qetiyane û her yek bûye beşek ji wêjeyê.

Mirov dikare bibêje, biwêj ketine nava zimên û wekî haya mirovan jê tune be û peyv bi vateyeke din tê bi karanîn.Biwêj wegotinên bi qalibên taybet in ku ji bo mirov têginekê an tevgereke mirovan bîne zimên, hatine holê.Lê Gotinên pêşiyan qaîdeyên wan î gelemperî heye. Dema ku gotineke pêşiyan tê gotin wekî ji herkesî re tê gotin û di her demê de li her derê mirov dikare bibêje. Lê biwêj ji bo taybetiya yekî an tiştekî têne gotin. Mînak, mirov bibêje : "H*eta tu hat ba min hasil di Mûsilê re derbas bû*". Ev biwêj ji yekî tenê re tê gotin, tu bandorê li yê sêyemîn ku li ba mirov be nake.

Wekî me di şîroveya pirtûka A. Balî de jî gotiye, carinan bêyî vîna mirovan têne bikaranîn. Ne hewceye ku mirov bibêje "ezê biwêjê bikar bînim" lê ji bêgavî têne bikaranîn. Bûne hêmanên hevok û zimên.

www.arsivakurd.org

**Rewşen Bedirxan:**

# "Yekêtiya Kurdan bide min, ezê kurdistanek azad bidim te"

**Festivala 100 saliya Şajina kurd Rewşen Bedirxanê:**

Sibêdehiya roja Duşemî, 09,11,2009'an, festîval û sempozisyona 100 saliya şajina kurd, Rewşen Bedirxanê li Hewlêra Paytextê Herêma Kurdistanê (Hola Pêşewa) hat lidarxistin. Festîval bi beşdariya malbata Rewşenxanê, nûnerên part û rêxistinên siyasî û hikomî yên kurdistanî, herweha rewşenbîr û nivîskarên biyanî û kurdistanî bi sirûda netewî ya "EY Reqîb" dest pê kir.


Şandek ji rêberiya PDKÎ jî bi serperistiya birêz Rostem Cehangirî endamê Deftera Siyasî, Tahir Mehmûdî endamê Komîteya Nawendî û Dara Natiq endamê Cihgir yê Komîteya Nawendî û hejmarek kadrayên ragihandin a vê partiyê beşdarî vê festîvalê bûn.

Di destpêkê de birêz Dr. Kawe Mehmûd, Wezîrê Rewşenbîrî yê H.H. Kurdistanê di axaftinekê de serbarê bixêrhatin kirina hemû beşdar û mêvanan, herweha bal kişande ser kar û xebatên wê şêrejina kurd li wî serdemî de û ew bi sefîr û berevankarê pirsa gelê xwe da nasîn. Wî herweha got ku hêvî û daxwaza Rewşen xanê, yekgirtin û yekêtiya gelê kurd bûye û heya roja dawiyê jî hewl û xebat bo vê meremê û beşdariya bi bandor li pirsa jinan û wekheviya li nav civakê de da. Gelê kurd deyndarê wan kesane ye û divêt em deyna wan li ser xwe hildin.

Paşan gotatra birêz Celal Talibanî bi nûneratî ji aliyê Ednan Moftî ve hat Pêşkêşkirin, ku di peyamê de gellek bi berfirehî bas ji rol û tesîra wê Şajina kurd li bizava rewşenbîrî a kurd de hati bû ykirin.

Li beşek din ji vê festîvalê de, fîlmek dukumêntî li ser jiyan, biserhat, kar, xebat û berhemên şajina kurd, Rewşen xanê Pêşkêşî beşdaran hatekirin.

Paşan her yek ji rewşenbîr û nivîskarên kurd Dr. Kemal Mezher, Reşîd Findî, Dara Bîllek, Mihemed Selîm Suwarî û Mamosta Fexriyê bi rîz axaftinên xwe li dor kesatiya




Rewşenxanê, konferansa Yûnanê li sala 1957'ê, yadigariyên pêre, radyoyên kurdî û bi giştî kar, berhem û xebatên wê şêre jina kurd peşkêş kirin.

Beşek din ji karê festîvalê taybet bû bi vekirina pêşangehek ji wêne û berhemên Rewşenxanê, ku bûye cihê dilxweşî û rizamendiya beşdaran.

Dûre destgulên her yek ji Hêro Îbrahîm Ehmed û heval Xeco, pêşkêşî sînem Bedirxanê hatin kirin, paşan helbestvan Qadir Qaçax çend parçe helbest pêşkêşî beşdarên festîvalê kir û bi vê çendê jî xemlek taybetî da vê yad û festîvalê.

Herweha her yek ji nivîskarên kurd, Mehmûd Bekîk û Dr. Husên Kîkî di axaftinên cuda de bas ji kesatiya wê şêrejina kurd û kongireya Qahîreyê li sala 1956'ê û tesîr û bandora Rewşenxanê li ser wan bixwe kirin û komek bîrhatinên binirx bi Rewşenxanê re Pêşkêşî beşdaran kir.

Dawîn beşa vê yad û sempozisyonê jî, axaftina Sînem Bedirxanê weke nûnera malbata Bedirxaniyan bû ku têde spasiya xwe û malbata xwe ji hemû mêvan û beşdarên festîvalê kir. Festîvala 100 saliya şajina kurd, rewşen Bedirxanê di nava pîrozbahiyên germ yên beşdaran ji Sînem Bedirxanê, seet 2'ê Piştînîvro bi dawî hat.



**Şanda PDKÎ di festîval û sempozisyona 100 saliya şajina kurd, Rewşen Bedirxanê de li Hewlêra Paytextê Herêma Kurdistanê**

## Bi kurtî Rewşen Bedirxan



Rewşen Bedirxan di sala 1909'an de li Qeyseriyê ji dayîkbûye û malbata wê di sala 1913'an de jiber xebatên siyasî sirgûnî Rojhilata Navîn bûn. Bavê wê Salih Bedirxan e. Rewşen Bedirxan, hîndekariya xwe li Şam û Ûrdûnê berdewam kir û li Ûrdûnê bû yek ji mamosteyên jin ên destpêkê. Rewşen, di sala 1935'an de bi Celadet Bedirxan re dizewice. Rewşen Bedirxan, dibe yek ji nivîskarên Kovara Hawarê. Di sala 1957'an de li Yewnanîstanê kongreya dijberî-mêtingeriyê tê lidarxistin û di nava 6 delegeyên Kurd ku lazime beşdarî kongreyê bibin, tenê Rewşen Bedirxan beşdar dibe. Di sala 1971ê de li ser daxwaza Mustefa Barzanî, diçe Başûrê Kurdistanê û li bajarê Hecî-Ûmranê Yekîtiya Jinên Kurd saz dike. Nivîskara jin a Kurd Bedirxan, bi çalakiyên xwe yên di warên civakî, siyasî û hîndekariyê de tê naskirin.

Di nava berhemên Rewşen Bedirxan de gelek pirtûk û werger hene. Heta roja mirinê jî ew ji bo gel û welatê xwe xebitî. Mixabin di 01.06.1992'an de nivîskara Kurd Rewşen Bedirxanê jiyana xwe ji dest da û li Şamê li teniştа mêrê wê, Celadet û bapîrê wê Bedirxan Beg li goristana Şêx Xalidê Neqşibendî hat veşartin.

**Berhemên wê yên çapkirî**

1 Bîranînên Jinekê, werger, ji zimanê Tirkî bo Erebû, 1951.
2 Xeramî We Alamî, werger,(çîrok)ji Tirkî bo Erebî 1953.
3 Bîranînên Mamosteyekî (sê pirtûk), werger, ji Tirkî bo Erebî 1954.
4 Rûpelên ji Toreya Kurdî 1954.
5 Nama Gelê Kurd (helbest-Goran) ji Kurdî bo Erebî 1954- ji ber rewşa siyasî navê xwe li ser vê pertûkê ne nivîsî ye.
6 Name ji Mustefa Kemal Paşa re, werger ji Tirkî bo Erebî (Ev pirtûk bi alîkariya min hat nivîsîn, çapkirin û belavkirin).
7 Bîranênên Min-Salih Bedirxan-,werger ji Turkî bo Erebî. (Ev pirtûk jî bi alîkariya min hat nivîsîn, çapkirin û belavkirin).
8 El-red 'ele El-kosmopolîtiye, Mehmûd Şiniwî, werger, (ji ber hin sedemên siyasî navê xwe li ser vê pertûkê ne nivîsî).
9

**Pertûkên wê yên ne çapkirî**

1. Bîranînên jinekê (perçê duwemîn). Ev pirtûk hate çapkirin.
2. -Bavê min Abdulhemîd-nivîsa Ayşe keça Sultan Ebdulhemîd e.
3. Bîranînên min. Destnivîs e.

agiri

**Duheftînameya siyasî, civakî, çandî û hunerî**
**Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne**

**http://www.kurdistanmedia.com/kurmanci/index.php**
**Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.**
**Navnîşana derveyî welat:** AFK B.P. 102- 75623 Paris CEDEX 13 –FRANCE

**E - Mail:**
**agiri2003@hotmail.com**
**agiri2003@gmail.com**




## Govara "Jinan" Di Konferansa "Berevanîkirin Ji Mafên Werzişî Ên jinên Îranî" De, Pileya Duhem Bi Dest Xist




Kovara "Jinan", belavoka Yekîtiya jinên Demokrat ên Kurdistana Îranê, di konferansa salane a "Berevanîkirin ji Mafên Werzişî ên Jinên Îranê ên derveyî welat" de, pileya duhem bi dest xist.


Nûçegihaniya Kurdistanê di vê derbarê de ragihand: Civaka Rojnamevanên warê Werzişa Îranî li derveyî welat, roja 10. 11.2009'an, konferansa xwe a salane bi beşdariya 84 kes ji endamên wê civakê, li bajarê Hewlêrê lidarxist. Welatên Amerîka, Almanya, Kanada, Birîtaniya, Swêd, Norwej, Usturaliya û Fînlanda, endamên wê civakê ne.

Di konferansa han de ku bo heyamê 3 rojan dom kir, xalên girîng û veşartî ên pêkhateya werzişa Îranê di asta rêveberiyê de, bi armanca berevanîkirin ji mafên werzişî ên zarok, nûciwan, jin û kêmasiyên olî û herwiha dûrketina rola werzişvanên Îranê di asta bilind de, ketin berbas û hatin şirovekirin.

Di vê konferansê de kovara "Şêrejin" pileya yekem û kovara "Jinan" pileya duhem bi dest xistin. Du govarên han di heyamê sala borî de, ji bo berevanîkirin ji mafên berheq û rewa ên Îranê, gotarên werzişî belav kirine.

Sibêdeya roja duşem, 16.11.2009an, şandeke Yekîtiya Jinên Demokrat ên Kurdistana Îranê bi serokatiya "Hêro Celdiyanî, berpirsa saziya han, ji bo wergirtina xelatê, serdana Hola Werzişî a bajarê koyê kir û ji aliyê "Ako Cehad", endamê rêveberiya Federasyona Fûtbal a Herêma Kurdistanê û Serokê Tîpên Neteweyî ên bajarê Koyê ve, xelata xwe wergirtin.

## Dadgeha "Qanûna Esasî" ya Rûsiyayê hukmê Îdamê rakir



Li gorî Nûçegihaniya "Riya Nûstî", dadgeha Qanûna Esasî ya Rûsiyayê birêvebirina hikmê îdamê di Rûsyayê de, li destpêka meha Janurary a 2010'an de qedexe dike. Biryara han li roja pêncşemî 19,11,2009'an ji aliyê dadgeha Qanûna Esasî hate dayîn.

Serokê vê dadgehê da zanîn ku eva deng û biryara dawîn e û êdî nahê guhertin.

## Îran yek ji gendeltirîn welatên cîhanê




Rêxistina "şefafiyeta Navnetewî" rapora salane ya xwe weşand ku têde refbendiyekê ji bo welatên cîhanê li gorî fisad û gendeliya îdarî û hikûmetî dike.

Nirxandinên vê rêxistinê li ser gendelî, bertîl, kirîn û firotina postên dewletî, bertîl li dezgehên Qazayî, fisada malî li nav siyasetvanan û berpirsên dewletî û herweha xebata nehewce li dijî madeyên bêhişker û... tên encam dayîn.

Li vê raporê de navê 180 welatan tê dîtin ku welatê Niyozlandê pileya yekemîn bidestxistiye. paşan bi rêz welatên Danmark, Sengapûr, Swêd û Swîs cî girtine.

Îran jî di vê raporê de, li pileya 168 mîn wergirtiye û ligel gendeltirîn welatên cîhanê de navberek gellek kêm heye. Bi wateyek din, tenê 7 welat di cîhanê de li warê fisadê de rewşek xirabtir ji komara Îslamî a Îranê hene. Weke: Somalî, Efxanistan, Birme, Sûdan û Îraq.

Hêjayî gotinê ye ku pileya Îranê li warê fisadê bi nisbet sala borî daketiye û xirabtir bûye.

## Eşq Û Qehwe Tenê Bi Germî Xweş In!!!



Mêjdem e ku dibêjin eşq û Qehwe tenê bi gemî xweş in. Lê lêkolînan derxistiye ku çayî û Qehweya pir gerim(kel) jî, zirarên xwe hene. Pisporên warê saxlemiyê didin zanîn ku vexwarina çaya kell, egera tûşbûn bi Penceşêra gewriyê zêde dike.

Berê Pijîşk li ser vê baweriyê bûn ku sedema sereke ya tûşbûn bi Penceşêra Hewik û Gewriyê, Cigarekêşan û vexwarinên elkolî ne, lê niha derketiye ku xwarinên pir gerim jî dibine sedema şewltîna malên gewriyê û tûşbûna bi van nexweşiyan.

Lewra ger hûn dixwazin tûşî vê nexweşiyê nebin, pifekê li ça û Qehweya xwe bikin û bila ser bibe ! Ew car vexon û hinoş û can.